# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (249):

## Tewaneke hovane ye hevdudanî, Gundê "Se'irîncekê" - koçberkirin û desteserkirineke fere, destdanîna li ser erdine kenara Çemê Efrînê, binpêkirinine virdewêde




















Geregoşî û serberdayetî û tewan bi hemî rengên xwe ve, li herêmên di bin Dagîrkeriya Turkiyê de, navnîşanine berz û berdewam in, lê Erdoxan li ser Bakurê Nexşeya Sûriyê wê wêne dike û di Neteweyên Yekgirtî de hildide, **û bi derewîn dibêje ku ew herêmine aram û hêmin û tebat in!** Nemaze li Efrînê kuştin, girtinên bêsûcane, îşkencekirin, peresitandin, dizîn, destanîna li ser malmewdanan, guhertina demografî, dizîna malmewdanên çandî û qirkirina jîngehê û yên din -**tewanên şer û tewanên li dijî mirovahiyê**- bi şêwakî rêbazkirî û berdewam pêk tên.

**Ev jî hin bûyînên li ser rewşên serwerkirî ne:**

**= Tewaneke hovane:**

Li dora kat nehan sibehê, û di tewaneke hovane ye hevdudanî de, çekdarekî/çekdarina mala Hemwelatî "**Henîf Henan Xelîl**" ji xelkê Gundê "Qîbarê" bi zorê basmîş kir, li nêzîk Gergeha "Maratê" li orta Bajarê Efrînê, piştî çûndina wî bo karê xwe, û bi awakî mebestkirî bi çend derbên kêran û şerjêkirinê hevjîna wî "**Ofê Şêx Ehmed keça Ze'îm** /37/sal" ji xelkê Gundê "Şêx" - Navça Reco kuşt, /300/G zêr û tibabine diravî ji mal dizîn û agir jî bi malê xistin, ta ku termê wê bo "Nexweşxana Efrînê ya Leşkerî" hate guhestin, û agir ji aliyê "Berevaniya Sivîl" ve hate vemirandin.

Divê were zanîn jî ku li dor Gergeha "Maratê" pênc biryargehên leşkerî yên Milîseyên "Feyleq El'mecid, El'mu'itesêm Bîlah, Mihemed El'fatêh, El'sultan Mûrad û Ehrar El'şerqiyê" hene.

Tu zarok herdu hevjînan çênebibûn;

Û di nav xemgînî û şêtmayîn û şermazarkirina girseyek ji xelkê û hezkiriyan de, termê wê di Goristana "Qîbarê" de hate binaxkirin, û ta niha Destlatên Dagîrkeriyê hûrgiliyên tewanê û nasnama tewankaran açiq û bêlî nekirine.

**= Gundê "Se'irîncekê":**

Bi Navça Şera ve girêdayî ye û /30/KM ji navenda wê dûr e, ji dora /130/malî pêkhatî ye, dora /900/nişte ji nişteciyên Kurd ên resen tê de bûn, li dema dijberiya li ser herêmê li 2018an. Z tev penaber bûn, jê tenê /8 malbat = 35 nişte/ vegerîn û yên din jî zorane koçber bûn, û dora /75 malbat = 525 nişte/ji anîndeyan tê de hatin niştecîkirin.

Di encama topebarankirina Turkiyê de mal û dîkanek ên "Mihemed Izedîn" bi awakî mezin hilweşîn û bi piçekî ziyan gihîştin du malên din.

Milîseyên "Lîwa'i Siqor El'şemal" gund desteser dikin, Mala - Vêla "Luqman Ereb" ji xwe re kirin mîvangeh û biryargeheke leşkerî, û piştî destdanîna wan li ser gund, tiştmiştên hundir malan talan kirin û dizîn, mîna: xwarinvexwarin, firaxên baqirî, cerên gazê, alav û amûrên elektirîkê û raxistok û mobîliya û yên din, û herweha jî kebil û guheztoka toreya elektirîkê ya giştî, jimarokên elektirîkê û ava vexwarinê, lûleya ava vexwarinê ya serekîn a ku avê dide gund, aliyet (Vana "Semîr Ereb", Bagir û tirektora çandiniyê yên "Tel'et Ne'isan", teksiya "Mihemed Isma'îl", û /3/ tirektorên çandiniyê), (giropeke zayenda elektirîkê, perçeguhêzokên makînan bi dora/100/ hezar Dolar) ên "Nebî Îsma'îl" û giropa zayenda elektirîkê (ampêran) a "Heyder Ereb"; Û li Bajarê Efrînê jî (du giropên zayenda elektirîkê, perçeguhêzên makînan bi buhaya/50/hezar Dolar) ên "Mihemed Isma'îl" dizîn.

Û wan aletên guvêşgeha zeytûna ya "Mihemed Izedîn" guhestin û avahiya wê ji rêbenda çekdar re kirin embar, û vêrgiyeke mezin li guvêşgeha "Mistefa Mistefa" xist ji bo rêdana karanîna wê û digel wê jî ferzkirina vêrgiyeke salane li ser.

Û herweha wan dest danîn ser bêtirî /15/ hezar darî zeytûnê, jê (/3/ hezar dar ên Malbata Mixtêr in, /2/hezar ên malbata Elo ne, /1400/dar ên Malbata Isma'îl in, /1000/ jî yên Malbata Ereb e), û 50% li ser berhemdana malmewdanên ên ne li wir (ên ku hin ji ber xwe ve danîne ku lê sekin) weke vêrgî ferz dikin, û 10% jî li ser berhemdana werzên/ mûsimên hemwelatiyên li gund mane.

Û wan piraniya darên îhracê li çiyayê Bakurê gund û girên Başûr Rojhilatê gund qut kirin, jê: Dora/2/hiktarî li Cîgeha "Bîra Şadiya" û dareke tûyê ye temenmezin li Cîgeha "Bira Tûyê", û herweha jî qutkirina bêwijdan ji hezaran darên zeytûnê re, ji bo êzingkirin û bazirganiyê; Ji bilî wê jî çêrandina bêwijdan ji keriyên pêz û dewêr di nav zevî û erdên çandiniyê de.

Weha jî wan "Girê Edem" (ê li Başûr Rojhilatê gund bi /2/KM dikeve û rûbera wê /0.5/hiktar) ji bo lêgerîna li kevneşop û kinzên binerd û dizîna wan rêş kirin û kolandin, piştî hilkirina bi dehan darên zeytûnê (yên "Riyad Elo") ji ser rûyê wê.

Û hemwelatiyên li gund mane jî rastî têvel cûreyên binpêkirinan û tengasîkirinê hatin.

**= Destdanîna ser erdan:**

Ji ber kêmbûna baranê û daketina asta gencîneya Benda "Meydankê" îsal, bi taybetî jî piştî filtandina beşekî jê ji bo tijîkirina Benda "Rîhaniyê" li aliyê Turkiyê û digel destpêkirina avdana erdên çandiniyê, ava Çemê "Efrînê" pir kêm bû û mirov kane bibêje ku li destpêkê zuha bû, û bi sedan hiktar ji erdên kenara çêm (ên ku ji binyat ve yên xelkên Gundên "Şîlte'itê, Dêrsiwanê, Vêrganê, Zêtûnakê, Alciya, Dêrwîş, Naza, Qerqîniya, Be'irava û Bajaroka Meydankê ne" bi kêrî çandiniyê bûn, da ku Milîseyên "Artêşa Niştîmanî ya Sûrî" jî rabin destan dînin ser, ji xwe re biçînin an jî her hiktarekê bi dora /500/ Dolar bi kirê bidin, û qedexekirina yên ewldar ku sûdê jê bibînin.

**= Binpêkirinine din:**

**-** Li 11.6.2023an. Z, Hemwelatî "**Kemal Hesen Menan** /60/sal" ji xelkê Gundê "Şêx Mehmedlî - Meydana" - Navça Reco li ser destên çekdarin ji Milîseyên "Feyleq El'şam" rastî lêdaneke mekin hat, li dema payandina wî ji zeviyê genimê xwe re, û di encamê de birîndar bû û bi bîr ve çû, û ji aliyê xelkê ve ji bo dermankirinê hate şandin. Weha jî Hemwelatî "**Şe'iban Hemîd Kîlîb** /30/sal" ji heman gundî, li vê dawiyê ji aliyê şivanine pêz ve tûşî dijîkirinekê hat, ji ber qedexekirina wî ji çêrandina pezên wan re di nav zeviyên zeytûna de.

**-** Li vê dawiyê bi piştgiriya milîseyan, xoceyê/îmamê Mizgefta "Selah El'dîn" - Rojavayê Cindirêsê -û ew ji anîndeyan e- dest danî ser perçerdekî avahiyan (yî hemwelatiya Kurd "Necah Sîdo keça Ebid El'rehman/Ebdoyê şûfêr" û di nav erdê "Abdîn Erebo" de û li ser riya giştî ya Cindirêsê - Efrîn), û li ser stasyûna firotina sûtemeniyê ava kir.

Ji ber ku Turkiyê dewleteke dagîrker û xwediyê desteseriya rastîn e li Efrînê, û li gor yasayên navdewletî di ber rewşên serwerkirî û binpêkirin û tewanên dibin de, tevaya berpirsiyartiyê hildigre.

18.06.2023 an

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**

**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

--------------------------

**Wêne:**

**-** Kuştiya vêguneh "Ofê Şêx Ehmed".

**-** Girê "Edem" ê kevneşopî - G. "Se'irîncekê" (29.1.2018an. Z berî dagîrkirin û kolandinê, 20.3.2022an. Z piştî dagîrkirin û kolandinê), Gogêl Êrs.

**-** Cîgeha "Bîra Tûyê" - G. "Se'irîncekê" (9.11.2017an. Z berî dagîrkirinê û qutkirina daran, 20.3.2022an. Z piştî dagîrkirin û qutkirinê), Gogêl Êrs.

**-** Cîgeha "Bîra Şadiya" - G. "Se'irîncekê" (24.2.2018an. Z berî dagîrkirin û qutkirina darên ihracê, 20.3.2022an. Z piştî dagîrkirin û qutkirinê), Gogêl Êrs.